



**Yekîtiya jinên kurdistanê
li Swêdê**

Edresa postê
Box 15 218
104 65 Stockholm/Sweden

Edresa serlêdanê
Gustavslundsvägen 168- ALVIK
STOCKHOLM

Telefon:
+46-8-6422155

E-mail:
info@yjks.se

Homepaige:
www.yjks.se



**Yekîtiya jinên kurdistanê
li Swêdê**

www.yjks.se

Yekîtiya jinên kurdistanê li Swêdê

Yekîtiya jinên Kurdistanê li swêdê bi kurtî (YJK-S) rêxistineke serbixwe ye ,ji bo jinên kurdistanê li Swêdê bi tevahî kar û xebata xwe dike ,bi tu rêxistinên siyasî yan jî olî ve ne girêdayî ye, li seranserê Swêdê wek fedrasiyonekê, di nav komele û komîtên xwe de çalakiyên xwe bi cî tîne .YJK-S di sala 1992an de ava bûye . ji bo karekî giştî, berfirah û tund xwe amade kiriye, wekheviya jin û mêran, demokrasî û bidestxistina mafê jina xebata wê ya serekiye. YJK-S di hemû salên xwe de li gor destûra xwe çalakiyên xwe pêk aniye.

Armancên YJK-S

YJK-S:

- Kar dike ku Jinên kurd li Swêdê bi rêxistin bikin her uha wa amade bikin ji bo xebata pirsê entegrekirinê di civata swêdê de.
- Kar dike ku wekhevî di nav Jin û mêran de di hemû merc û qadên jiyânê de peyde bibe, li ser pirsê jina bi tundî radiweste da jin karibin li gor mercên berpirsiyariyê di civatê de beşdar bibin.
- Li hember biçûkxistin û dijminatîya biyaniyan kar dike.
- Li dij bîr û baweriya patriyekaliyê (desthiladariya mêran) di civata kurdan, wek ya di civata swêdiyan de kar dike.
- Li dij tundetûjiya li hember jinan tê kirin kar dike.

- Ji bo mercên jiyana xuşkên xwe yê li hemû beşên kurdistanê baştir bike, bi tundî kar dike.
- piştgirîya tekoşîna gelê kurda li hemû perçên kurdistanê ya ji bo mafên millî û demokratî dike. Yekîtiya jinên Kurdistanê li Swêdê ji bo te, jina kurd çêbûye û herdem heye bê ku mercan ji bo alîkariya te deynîpewendiyê bi me re deyne, gava ku alîkarî ji te re pêwîst be, em ji bo te her hene, li virin bende te ne.

Ji bo ku YJK-S armancên xwe bi cî bîne konferans, semîner û kursan, her uha havîngehên malbatî li ser van babetên li jêr amade dike.

- Pirsgerêkên di nav nîfşên kurda yê kevî û nû de
- Pêwendiyên malbatî
- Demokratî û wekhevî di nav malbatên kurd li Swêdê û li welat
- Tendurustîya jina bi giştî her uha ya cinsî
- Întegrîtê
- Pirsên penaberî
- Pirsê ciwana û pirsê keçên ciwan yê bi kêşê û problêm
- Guhertina rewşa jina

Ji bo van xebatan pêwîstiya me bi jinên ku bi dilxwazî kar û xebatê bi me re bikin da em bihevî li ser van pirsan rawestin û bi pêşxînin, were bi me re be, da ev yekîtiya te be jî ,were bibe endam û para xwe jî, têxe xebata yekîtiyê da em bihevî bandora xwe hêztir bikin û alîkariya xuşkên xwe bikin, were em li bende te ne.

Navnîşana me:

Gustavslundsvägen 168 A T-Bana-Alvik

Postadress:

Box:15218,104 65 Stockholm

Telefon: 08-642 21 55, Fax: 08-642 21 55

E-Post: info@yjks.se

Yekîtiya jinên kurdistanê li Swêdê li ser me bêh-tir bixwîne, li ser Projêktên me, Çalakiyên me û karê me di malpera me de WWW.YJKS.SE

Yekîtiya jinên Kurdistanê Li Swêdê

Pêwendiyên we bi me re me Kêfxweş dike!



www.yjks.se